

Sefera Hindistanê - 4


Tuktuk her carê li ser wan kort û çalên rê kildibû û dadiket, dil û hinavên me dianîn xarê. Em peya biçûna, sed car ji wê siwarîyê çêtir bû.

Hans di destan da maşîne şeqûşeq fotoyan dikişîne. Min jî hewl da çend heban bikişînim, lê ji tengayî û qerebalixê nedikarîm bizivirim. Heta em ji wê çarşîyê derketin, du saet derbas bûn, ku bi pêyan meriv dikarîya di nîv saetan da tamam bike. Piraniya kolanên bajarên mezin ên Histanê wiha halê mahşerî ne.

Gandîcî

Piştê ku em ji wê dojeha qerebalixê derketin, min xwest nefesekî kûr bikişînim. Nafîle! Hewaya qirêj a Delhîyê bîne li min çikand. Bikarim vê seferê saxlem tamam bikim, lotto ye.

Dema em hatin ber otobosê, rêberê me got: „Em dê niha biçin serdana monumenta Mahatma Gandîyî.“ Heyecanekê bi min girt. Tawilê em dê herin ser tirba bavê Hindistanê, ku tê da bûye xwelî. Bapu Gandîyê ku bi aramî û ramanên xwe yê aştiyane, milyarek însan li dijê dagirkerîya Îngilîzan rakir serhildanê û di demeke kin da vê parzemîna mezin gîhande serxwebûnê. Wisa jî bû sembola qencî û azadîyê li hamû cîhanê. Hindî ji hezkirinê jê ra dibêjin bapu (bavo)Gandîcî. Ev mirovê ku ewqas tê hezkirin, mixabin bi destê fanatîkekî Hindî hat kuştin. Ew fanatîkên serêşên mirovahîyê.!



Yekemîn çalakiya wî; şewitandina nasnameya kolonyalîst a îngilîzî bû. Bi biryarî û filozofîya xwe milyarek însan rakir ser pêyan û welatê xwe rizgar kir. Ew ne tenê bavê Hindîyan, bavê serhildana sivil e jî.



Tirba Gandî, li Delhîya nû ye. Bi awayeke sade û ji mermerê reşgewr hatiye çêkirin. Zalim û dikîttor biçûk in, gorên wan qirase ne. Gandî mezin e, gora wî sade û mutewazî ye. Bi sed hezaran Hindî di cejinên xwe yê neteweyî da tî serdana vê monûmentê. Gul û kulîlkên li ser tîrbê her carê tî tazekirin. Tîrb di parêşê mezin da ye û muzeya Gandîyî jî li wir e.

Gandî 2. cotmeh 1869 an li herêma Guyaratê hatiye cîhanê, Di çileyê 1948 an da li Delhîyê jîyana xwe ji dest daye. Gandî li Îngilistanê huquq xwendîye. Ji bo gelê xwe ji dagirkerîyê rizgar bike, pêşî hatiye Afrîkaya başûr û ji wir jî çûye Hindistanê. Li wir şoreşa serxwebûna Histanê daye destpêkirin û heta serkeftinê şoreşê tamam kirîye. Ew xwedîyê gelek pisporî û taybetmendîyan bû. Mîna

şoreşgerîya pasîfist, ramiyar, feylezof, popîlist, mamostayê sinc û moralê. Monumenta Gandî li Delhîya Nû ye. Delhîya Nû li başûrê Delhîya Kevin di salên 1911an de di dema dagirkerîya Îngilîzan da, bi mîmarîya Ewropayî hatîye avakirin. Koşkên sor, ên mister û missan, ekselansan û sahîb-mahîban felan, baregehên leşkerî, avahîyên walîyên kolonyal, parlamento, ku îro hemû avahîyên dewleta Hinistanê ne, li Delhîya Nû ne. Şênîya Delhîyê bi der û dorên xwe va 26 mîlyon e. Piştê Bombay duyemîn bajarê mezin ê Hindistanê ye. Delhî yek ji metropolên mezin ê cîhanê ye.

Monûmenta Gandî di nava baxceyê mezin da, tije bi gul û gulustan hatîye çêkirin. Zahf lê hatîye. Ev baxçe di heman demê da mûzexaneyê Gandîyî ye. Nivîsên wî, berçavika wî ya ku sembola Hindistanê ye, kopalê wî kiras û derpêyên wî yên spî ûwd. di vê mûzexaneyê da tîn parastin.

Gora wî pir sade ye. Ji mermerê û çargoşe ye. Dema hatim ber monumentê min bejna xwe bi rêzdarî li ber vî merivê hurik û mezin tewand. Kesên ku angaşte kirine û dikin dibêjin: „Em serok û rêberên Kurdistanê ne.” Hatin bîra min. Çiqas ji hev dûr. Bi dehen „serok” û „rêber” derketin, kurdan wan wek „pêxember” heband, dihebîne. Encam Kurd sedan sal in, hêjî benî, Kurdistan hêjî wêraneyêke bênav e. Gandîyek derket di nava du-sê salan da welatekî deh car mezintir ji Kurdistanê rizgar kir. Niha hun dê bêjin; „Ma Îngilîz û dagirkerên Kurdistanê mîna hev in? Berevacî. Di bin dagirkerîya Îngilîzan da heke meriv bikare çend sal bijî, di bin dagirkerîya tirk, ereb û farisan da nikare rojekê bijî!”

Rojbûna Gandî 02. cotmehê, cejna neteweyî ye li Hindistanê. Di vê rojê da bi sedhezaran meriv diherikin baxçeyê mûzexaneyê. Hindî ji vê derê ra dibêjin Gandî Smriti. Dema em ji mûzexaneyê vegeyîyan, min çîroka belgesel-fîlma Gandîyî ku di sala 1982 an da ji alîyê Richard Attenboroughî va bi serkeftin hatibû kişandin, ji Paragamî ra vegot. Ev fîlm ji alîyê Oskarê va bi heşt xelatan hatîye xelatkirin. Dîsa ev fîlm di dawîya salên 1990 an da bi kurdî hat wergerandin. Dublaja dengê Ganîyî jî min xwendibû di fîlmê da. Çiqas tê bîra min bi vê rola xwe şa dibim. Paragam jî bi min ra kêfxweşbû û rêzdarîyêke mezin nîşanê min da, bi vegotina çîrokê. Ev fîlm di wan salan da di MED TVyê da jî hatibû nîşandan, ku ew têlevîzyon têkilîya wî niha bi kurdî ra nema ye.



Bêhnvedana çayê li bajarê Ajmerê. Ev xanima xizan li ser rê, çaya hindî difiroşe. Çaya hindî ji gelek biharatên têkîl çêdibe, îsot jî dixîn navê û gelek tûj e. Derman e ji bo germayîya Hindistanê. Dezgeha xanimê gelek qirêj bû, lê çaya wê dîsa jî vexwarbar bû. Ew her du kalên li pişt, di stîya darê da bêhn vedidîn. Ez ê gavek, şûnda herim cem wan.

Piştê ku me xatirê xwe ji Gandîcî xwest, îcar me berê xwe da navenda bajarê nû. Cîyê ku parlamento, koşka serokdewlet (berê ya walîyê kolonyalîst bû), avahîyên hukumatê felan. Yanê meydana desthilatdarîyê. "Lûtkeya" dewlet, rêveberî, zext û zorê. Ji ber metirsîya hêrîşên terorîst ên rêxistinên îslamê, gera der û dorên avahîyan hatibû qedexekirin. Baş bû, ku em neçûn. Mîna mabedên olên hêrîşkar, ez hez ji avahîyên dewletê jî nakim. Em bi otobosê ji meydana derbas bûn, hatin ber India Gate.

India Gate, monument e. Di sala 1921 an da, ji bo bîranîna 90.000 leşkerên hindî ku ji bo berjewendîyên Îngilistanê di yekemîn şerê cîhanê da hatibûn kuştin, hatîye çêkirin. Teqlîta *Arc de Triomphe* ya Parisê ye. I. Gate 42 m. bilind e. Ji kevirên pûk ên sor di nava baxçeyêke mezin da hatîye çêkirin. Bi hezaran xort û zarokan li her du alîyên rê li ser table û erebeyên biçûk, xwarin û vexwarinên hindî difrotin. Artêşêke kermêş jî li ser wan xwarin û vexwarinan danîbû. Ew xwarin her çiqas bala mirov bikişînin jî ji gemarî û qirêjayîyê meriv nikare bikire û bixwe. Yê Delhîyê dîsa hinek îdare dikirin. Xwarin û vexwarinên bajarên din hîn gemartir bûn. Lê Hindî ne xema wan bûn, dixwarin wan xwarinên seyar. An na mîlyarekî mirov zikê xwe dê çawa têr bike?



Şivayê sembola huzur û medîtasyonê



Mezintirîn mabeda ola hinî; Akshardham-Guyartî

Dema ez li ber wan tableyan digerîyam, Hans bi panîk ber bi min da hat, got „Eman! Gisela winda bûye!“ Em çûn ba otobosê. Giselayê malnişîn hîn nehatibû. Humû grub em li benda wê man. Paşê me dît, belqitî kulek û kulek ber bi me va tê. Hansî gotê, „Keçê tu li kuderê mayî?“ Gîselayê, got „di nava vê qerebalêxê da min we û xwe jî winda kiribû, lê digerîyam.“ Ev jî yek ji tîpîk henekên almanî bû, di wê sefera me da. Em kenîyan û bi hev ra em çûn meydana Connaughtê.

Li Wir saeta rojê bi navê Yantar Mantar heye. Me ew dît. Di nava darên palmeyan da hatîye avakirin. Ji alîyê racayê herêma Yaipurê yê bi navê Yai Singihê II. va, di sala 1725 an da hatîye çêkirin. Ji ber sîya li ser pêlikên vê qaîdeyê, meriv dikare saet û demên rojê tam nas bike. Her wisa tevgerên astrolojîk jî.

Ber bi êvarê me berê xwe da mabeda ola hindî Akshardahm-Guyartîyê. Ev mabed bi mîmarîya kevn û ya nû hatîye avakirin. Mabedeke mezin a bi kompleks e. Avahîyên wê li ser erdekî 360.000 m² ava bûye. 3000 mîmar, endezyar, hosta, 7000 hunermend, bêku heq û pereyêkî werbigirin, ji dil tê da kar kirine. Gelek avahîyên hunerê, salonên konferans, sînema û pêşengehan di kompleksê da cî digirin. Akshardahm-Guyartî wek mezintirîn mabeda ola hindî ye li cîhanê. Avahî di sala 2005 an da tamam bûye. Mabed, bi van taynetmendîyên xwe va di pirtûka rekor a Guinnessê da jî cîyê xwe girtîye.

Piştê gereke biwest û xweş, em derengîya êvarê vejerîyan otêlê. Ji ber qirêjîya hewayaya bajêr, piştê her gerê divê meriv hema here serşokê xwe bişo, berê ku tiştêkî din bike. Ji şansê min ra ew şev li otêlê deweteke hindî jî hebû. Min jî îşlikê xwe yê gulgulî mîna yê Hîndîyan li xwe kir û çûm dawetê. Min silavekî hindî da wan û çûm li ber maseyekê rûniştim. Her çiqas rengê min hinek gewrik bûbe jî, zêde ne xerîb bûm ji wan ra. Gelek qedrê min girtin. Salon adeta deryaya rengan bû. Nemaze cilên xaniman ku awa bi awa dibiriqîyan û ewqas jî li wan hatibû. Hela muzîka hindî, ez mest kirim.



Siwarîya erebeyaya kerê li Mandarwayê



Qamyon û wesayîtên wan jî mîna Hîndîyan rengin in.

Ew şev ji wan şevên min a nadîre bû. Bêku şîyar bim, heta sibeyê razam. Sibe zû piştê taştêyeke bi têra xwe hindî, me li pey Paragamî berê xwe da balafirxaneyaya Indira Gandîyê. Ji wir em ê bifirin qeraxê çemê pîroz Ganjê. Em ê biçin Vatîkana Hindî û Budîstan Varanasîyê. Ku dîtina wî ji mêj va xeyala min bû. Pêleke heyecanê ez girtim, heta em siwarê balafirê bûn.

Bajarê "pîroz" û bêban Varanasî

Piştê seatek û niv şûnda em gihîştin Varanasîyê. Dema balafir li Varanasîyê danî hewa daneser 32 pîle bû, herçiqas meh adar bû jî. Hewa toz û dûman û erd deryaya çopê bû. Varanasî li eyaleta Uttar Pradeşê ye. Mîlyon û niv mirov dihewîne. Yek ji bajarên herî feqîr ê Hindistanê ye. Ji sedî 70 nişteciyên bajêr bêban in. Yanê li vir pirsgirêka kirêya xênî, heqê av û elektrîkê tine.

Xelq li ser kolanan, li qerexê Ganjê di nav çop û xubarê da dijî. Di binê telîs û çarşefekê da radizên. Pir caran ew jî tine. Ne nexweşxane, ne doktor heye ji bo feqîran. Hezret çêlêk ji wan binirxtir in.



Hindî mirîyên xwe di beyanîyê da bi kefenan dipêçin û paşê bi hîlbûna rojê ra li ser qûçên êzingan dişewitînin. Xwelîyên wan davêjin ava çemî. Hem ava kanîzasyonê, hem jî qirêjayîya merivan vî çemê bêhed qemar kirine. Ganj "pîrozwerîya" xwe wînda kirîye. Kengê ew dê paqij be? Ew jî nizane.

Hindî mirîyên xwe, dibin li qeraxê Ganjê li ser qûçên êzingan dişewitînin û xwelîyên wan davêjin ava Ganjê. Heke tam neşewitin, carinan parçeyên hestîyan jî bi avê ra diherikin.



Tîrêjên roja beyanîyê û Varanasi. Platforma li pişt min Tulsî Ghat e. Êvaran li ser wan pêlikan ayîn çêdibe. Ev bajar bi hemû rûyên xwe bandoreke derûnê çêdîke li ser meriv.



Ji bo turîstan jî êdî bûye edet, ku fîndekî di nava gulan da, bi tevê daxwaz û hêvîyên xwe dayînin ser pêlên Ganjê. Êdî maye li ser bextê Ganjê, ka ew ê wan hêvîyan bihere bavêje kûderê?